Şêrê di bîşe min dî, pencah sal bûyî
Lawîdê şêrê nêçîr, rêjhar bibin wehaîb

Leylaye Qeys kuştî, Zîna Memû biriştî
Şîrazîya dikêşin, ba mixleban we'saîb

Yanî Melay Cizîrî, belkî 'Elî 'Herîrî
Ferhad û Xûsrewane, bû kuştina me'talib

(Efre'ttû fî hewaha, welqelbû fî newaha)
(Yeq'zî 'eleyye bu'iden, fî eb'edîl meratib)

(Înnî re'zîtû mînha, bîl'hukimî fî bû'adî)
(Îz kellemet bîse'xrîn, za erfe'îl me'talib)

Desta ji dîn û dinya, vê le'h'zeyê dişûm ez
(Ma în leha 'e'zabûn, fîl rû'hî kellehaîb)

'Işqa me dit cewabê, wek tême ber 'hîsabê
(Yu'xnîhî zake 'emma, ferre'tû fîl mekasib)

(Kulle meriîn qerînûn, fî cûnbîhî weînnî)
('Îndî qerînû 'hubbî, fîl dehrî xeyrû kaîb)

(Lewlake ya 'hebîbî, ma în 'ereftû rebbî)
(E'irebtû 'enhû 'îlmen, fî mû's'hefîl dewaîb)

Min dilberek we dîbû, banaz û perwerî bû
Qestê dikin li bûşah, (bîlxeylî welnecaîb)

'Ednanî û Qureyşî, (mînha bîfetkî) 'eyşî
Tîra ji qews û ebrû, pêkan û canê 'saîb

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 97

Min dîne pir delaîl, bûrhanê der ’hemaîl
Remza ’ilûmê ’hîkmet, ’zahir tikin menakîb

’Sa’hib bi xû dizanî, Nûrî çi dil mirade
Îman û dîn û dinya, çûyîn bi derdê ’sa’hib

---

**Sîmîn ber: leş ciwan, kesê leşê wî wek zîv be.**
**Xirûş: hewarkirin, hawarkirdin.**
**Hemta: dûst, heval, hewta.**
**Bîmar: nexûş, xeste, nesax.**
**Bîşe: daristan, ’xabat.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 98

**Dilberî xûb**

{Be pehlû dilberê men şûr'teyî xûb}
{Risan în bendei der hicir aşûb}

Bikin terka neyarê dil mûnafiq
{Reqîban recim din ba seng û ba çûb}

'Hebîba pîrhen lazim ji xara
Reqîba ne'ileyê mismar û carûb

Wî'salek qismetê 'sa'hib dilan bit
Fîraq û hicrê her bit rûze me'hcûb

Li textê şahî û hemrazî ez bê
Li ber pala neyarî qu't bi xernû

Bi ew'safê resûl û sirrê Qur'an
Dibînim vê dinê hemraz û mensûb

Mixabin her mixabin bes mixabin
Kû dûrîn em ji wê dîdarê me'tlûb

'Heqîqet em di merfû'în û mecrûr
Bi çingalê serê zulfa te meczûb

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 99

Di cezbêda me dîtin ’eskerê ’xem
Emîn bû ’eskerê ’hubba te ye’isûb

Peyapey têne dil reştûze wi’llah
Di her weqt û deman bê weqt û bê nûb

Fîraq û mî’hnetê ’işqa te canim
Dibînim xûş ji ber me’hzûn û y’eqûb

Dikêşim mi’hnetê derdê fîraqê
Temaşa key tu carek ’halê Eyûb

Mû’hibbê dil birîndarîn û pir ’xem
Ji dermanan me her dîdare me’hbûb

Were pêkin lîqaê nameyê ’hal
Bi mûmû da bibînit ’halê mektûb

Bibêjî ’halê ’aşiq min bi xû dî
Di be’hra ’xem ji hicrana te mekrûb

Bi geryan û bi xûşîyan sebir nayê
Peyapey jê medîn ev ’hal û islûb

Dibê carek bixûnin şeh ’xulaman
Bipirsin kelleyê me’hbûsê meslûb

Eger nayê bi kêrî ’he’zreta şeh
Dibêjîtin nevê min ’ebdê me’iyûb

Kerem kit tûle û kelbê şikarî
’Heqîqet em ewîn bê şibih me’hsûb

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 100

(Xîtabî ew sûalî men yûlqa)
(Îla 'elîyetîl e'hbabî mex'tûb)

(Leqûltûl qelbû qelbel xellî lakîn)
(Menalûl kewnî malî mîmke mewhûb)

Bila Nûrî nemînin zêr û zîwer
Tinê dil dit bi Nûrî dilberî xûb

---

**Şûr'te: bayê şûr'te, cûrek ba û hewaye.**
**Pîrhen: kiras.**
**Xara: berê req, berdî req.**
**Peyapey: yek li pey yek, yek li dûway yek.**
**Kelbê şikarî: seyê nêçîrê, segî raw.**
**Zîwer: zêr û zîwer, xişil.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 101

**Kasa me nûşî**

Kasa me nûşî dayî, saqî kû da tijî nab
Hadir ji mewc û be’hran, teşbîhê nûn û girdab

Min dî ’xezal di çavan, dexsî kirî hinavan
Rey’han û simbila mest, havête dil xem û tab

Dîdar û qameta şeng, îna xirûşê xerçeng
Sed deq çi şikil min dî, ’er’er xiramê sîrab

’Seyyadê şêx û pîran, êxsîr tikin emîran
Ha’zir ji xelwexanan, him weqifan û mî’hrab

Sûzê di canê ’siddîq, bîraqê camê enbîq
Mislê me ’Hemzeyê şêr, girtin çewa Bin Xe’tab

Fermanberê te Cibrîl, ’hukumê te nusxê Încîl
Menzilgeha te keywan, feryadresê te wehhab

Îsbat û nefî û îmkan, dinya hemî di ferman
’Hikmê te kit bîyanî, lazim tibî ji îcab

’Alem hemî qelem bî, dinya hemî şikem bî
’Zahir bikin cemalet, teq’sîre nîne î’tnab

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 102

’Işqate ahe dîsa, canê me pê eyîsa
Aha me lew ji dil tê, herdem bi sûz û xûnab

’Hubba te ser’tema min, sîmîn ten û ’xema min
Sed nîşterin di dilda, ya keybirin di xellab

Cennat û xuld û ’hûrî, êk pertewî tu Nûrî
Ba’xê ne’îm û ri’zwan, ev nazika me ’heccab

Ev nazika şekirxa, qamet elîf û re’ina
Qamet nîma qîyamet, berda ji çerxê dûlab

(Yaûmûl fîraqî edha, ’îndel mû’hîbbî mîmma)
(Yelqahû Kerbelaî) ya Mehdîyê di serdab

Be’hrû berî û ’umman, nîşane ser’temî cûwan
(’Xayet lî’heddî ’xayet), em sermîyanê eq’tab

Ew ba’xê birve kûhan, ev sermîyanê ’îrfan
Salarê ehlê îman, wek dame kasê minyab

A’xûşê kûhne raze, ya gûlbenê mûcaze
Ya m’edena ’heyatê, ya caîgaha e’s’ha

Ya qîbleyî mûrîdan, ya mûrşidê ferîdan
Ferdim di her miqamat, sillab kûyî sillab

Îmkan nemaye çeşmek, berdit bi şe’işe’anî
’Ewqek li ber biwestî, fetta’hê qiflê her bab

Nûra û qelbê Nûrî, Nûrî çi bê qu’sûrî
Ya Nûre Nûrê ’torî, ya Nûrê rebbê erbab.

’Er’er: darek bala berze, darekî berze.
Xiram: rêveçûna hêdî-hêdî, rûştinî aram û belence.
Sîrab: têrav, têraw.
Feryadres: kesê di tengavîyêda bi hawar tê, nacî, ewey li hewarit dê.
Î’tnab: dirêjkirin, dirêje pêdan, dirêjkirdnewe.
A’xûş: bawiş, baweş.
Kûhne: kevin, kon, kewn.
Raz: sirr, sîrr, nihenî.
Gûlbûn: qefteka gûla, binçkey gûl.

**Leb**

Leb guheranê cêlweger, rabe ji dil bibîne leb
’Xunçelebanê sîmten, şerbetê engebîne leb

’Eynî te’înatê heqî, da dilê ’arifî şefeq
Min dîye zatê ’heq ji vê, ’xûnçeyê der kemîne leb

Ev qudûsî û muqteban, ah û fî’xanê gazîyan
’E’zmê remîmê gurzîyan, şewqe viser ketîne leb

Şewqe viser ketîne wan, cûhre di wê kewîne wan
Tab û ’xemî nerahimî, ’talib û mûşterîne leb

Bêşik îmamê cadeyî, bade ji leb çişawe dî
{Jehrê helahil în heme}, te’hlî û geh xûşîne leb

Leb neçû peng û qende ew, darûyî derdmende ew
Bû heme sûjî cigeran, derdê sikincebîye leb

Ba’sirreyê me ’amîyan, çeşmê sîyah û qarîyan
Kengî tibê kû ’se’h bikin, ’taqetî qa me nîne leb

’Taqetê qend û leb guher, serû xiramê sîne zer
Ke’ibe û (eswedûl ’hecer), ’alemekin nedîne leb

Roj û qemer ji ’xefletê, min kû didîn ji xecletê
Canê şirîn û dilfîda, roj û qemer kirîne leb

Lezzet û şerbeta lebî, ’eynî beqayê salike
’Arifê celwe canim ez, cur’e kû jê me dîne leb

Bade ji leb kû nûşî da, xûrrem û dil xirûşî da
Min nûhe can û hûşî da, cumle bi xû birîne leb

Xakê nihî bi şer neyê, ’un’surê sîm û zer neyê
Ger çikû xi’zr û ’arifîn, me’hyewîyê qewîne leb

Lê ne tewe’sul ’un’surî, xakê ne ab û agirî
Destê qedîrî çêkirî, mu’icîzeyî mûbîne leb

’Heq bi te dit ’înayetê, her çi te ew vîya wetê
Lûme kirîme pir ’hesed, dil bi ’xem û birîne leb

Med’h û senayê dilberê, fikir û xeyal û hûş û dil
’Aşiqê der se’hergehan, têkî hemî me’hîne leb

Dûr û diraze ey ’seba, nameyê ’er’zê ’halê min
’Er’zê bikî li ’he’zretê, nameyê lê bixwîne leb

Nameyê feqr û jarîyê, hilgire şeb si’harîyê
Belkî bixûnitin kû em, çendî mûşeweşîne leb

’Aşiq me terkê dit ji dil, ger çi cesed birîne min
Cinnû beşer di gel ewan, dibû mûzebzebîne leb

Ez bi xû her didim derê, me’zher û ’tûrê ’he’zretê
Behrê şîrîn û nekheyê, canê xûyî şîrîne leb

(Ente ferîdû ’he’zretî), ’xûnçelebê me Nûrîya
Hem nefesê me her demî, Nûrî û hem nişîne leb

**Engebîn: hingvîn, hingiv, hingwên.**
**Leb guher: dev guher.**
**Sikencebîn: cûrek şerbetêye.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 106

**Hûb hûb di meş**

Hûb hûb di meş hûb hûb
Kûb kûb di xûş kûb kûb

Ran ran li meydan ran
Xûb xûb ceheş xûb xûb

Xûş xûş bi qet bê hûş
'Tûb 'tûb ne hiş 'tûb 'tûb

Ûş ûş di her ûş ûş
Qûb qûb li leş qûb qûb

Mîr mîr di lawîr wîr
Zûb zûb keliş zûb zûb

Dar dar bekir dar dar
Nûb nûb ne hiş nûb nûb

Dah dah me niv dah dah
'Sûb 'sûb bimeş 'sûb 'sûb

Pak pak ji zik mak mak
Dûb dûb hemiş dûb dûb(**1**)

Çal çal li wî mal mal
Ûb ûb niviş dûb dûb(**2**)

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 107

Way way çi damay may
Zûb zûb zibîş zûb zûb

Nab nab ji kul nab nab
Sûb sûb dimeş sûb sûb

Tûb tûb ji dil tûb tûb
Yûb yûb ebeş yûb yûb

Kûn kûn bi cakûn kûn
Çûb çûb bi keş çûb çûb

Qûm qûm bi fa'tûm 'tûm
Şûb şûb biriş şûb şûb

Çîn çîn ji dil Nûrdîn
Hûb hûb me êş hûb hûb

---

**Cehîş: bazdan, xûşbezîn.**

(**1**) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li ser peyva "hemiş" di nav vê rêzê da nîşanek danîye ser û li perawêza rûpelê li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "ne 'xiş" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**2**) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li ser peyva "niviş" di nav vê rêzê da nîşanek danîye ser û li perawêza rûpelê li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "himiş" û li hember nivîsandîye (nûsxe) û li jêr herdu peyvên "dûb dûb" nivîsandîye "ûb ûb" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

**’Alemê ’xeyb**

Bi şehadet ji tera hatime ez ’sewme’ê ’xeyb
Lazî celweyê Mu’hemmed ne kirî ’xemze lûheyb

Diqîdemda be xû me’imûmê qedîmim li sema
(Mû’tleqûn sûmme seral şekkû bîna mînke we rîb)

(Enafî be’hrî wicûdîn ke’ebabîn ’zeheret)
(Wekebîrûn ’su’xurî înne şebabî hûwe şîb)

(Enaferdûn bî’sîfatîn lîye fîha reşe’hat)
(Kecebînî we xelîlûn we bîlalûn we ’sûheyb)

(Ena zûl mecdî welî be’ide şiûnîn xefîyet)
(We’eley îsteterret kulle ’e’tîyatû wehîb)

(Lîsemaî qedrî kuntû ene’llahû elem)
(Terfa er’zû berrîyatîhî tefrîcû kûrîb)

Gehî şêxim bi le’tafet gehî mu’htacî mirîd
Gehî salik gehî ’abid gehî zûnnare dicîb(**1**)

Gehî derya gehî dinya gehî bala gehî zîr
Gehî kafûr û ’ebîrim gehî miskim gehî ’tîb

Gehî Kirmanc û Ecem, geh şehî Faris û Rûm
Gehî Qey’ser gehî Kîsra, gehî Î’ireb û ’Ûreyb

Gehî ’heqqê bi ’heqîqet gehî Nûrî tûyî xelq
Gehî meşhûdê şehadet di girî ’alemê ’xeyb

**Zûnnare: ristika xiristyan li ber dikin, milwankey mesî’hyekan le ber diken.**
**Dicîb: di nav berîka min da, lenaw cîrfandam.**
**Zîr: jêr.**
**Şeh: şah, melik.**

(**1**) Şêx Memdû’hê Birîfkanî li jêr peyvên ”zinar û di cîb” nivîsandîye ”dînare di ceyb” û li hember nivîsandîye (nûsxe), ku tê mena li destxetek din da bi vî awayî ye.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 110

**Herf el-Tai (pîta ”T”)**

**Dil celîbit**

Te divê dil te bi rengê meh û xurşîdê celîbit
Her li jingarê sifir cewher û gewher ’emelîbit

Becelîsê mizlê kifnî li xû pêçe xemûlî
Dakû ’xessalî tefekkûr te bişûtin ne belîbit

Ne belîbit ji te yêk reng û nenasin ji te resmî
Însû we’hşet ji tera waris û hemraz û welîbit

Sedî pêncahê şewahid kû li bin ceybê kirasî
Te li her ca bi ’eyanî şahid na mu’htemelîbit

Hevrivê qaz û qulinga be di gel sîh û ’xezalan
Weh li kûhanê çû kewîn te meqamek cebelîbit

Qûtê rûhî ji gîya bit ca li her kehf û me’xaran
Xû li ser bes’tê zîra’î av ji ’xedran û gilîbit

Xawena dil ji te jengî ne bitin, ’eynî nîfaqe
Ger te dil ez hemî e’xyarî mûberra û xelîbit

Text û ’hîkmet we di bînim di binê çah û li ser çil
Qismetê jê bi girî ’sewme’e dê çahê celîbit

Pîr û ûstadî çi ’hacet bi ’Elî ’Heyderî hestin
Şev û roja ji tera pîrê xudawendê ’elîbit

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 111

Meh û sal û şev û roj û dem û gav ez hemî ’imr
Me biwarin bi xisaret ta vikengî hezelîbit

Wekû ’tiflan ji ’xirûrê bi dinê ’xafilîn em
Rûsîyahîn ji Xwedê weqte me şerm û xecelîbit

Xelweyek cilwe ji Nûrî me nedî safî bibit
Cilweya xelwe qeran sîne ji vê bedrê celîbit

---

**Xûrşîd: tav, hetav, taw, roj, ro, ’hetav.**
**Hevriv: dûst, hawrê, hemaheng, refîq, hawredîf.**
**’Xezal: asik.**
**Kûh: şax, çiya.**
**Qûtêru’h: xwerina rû’h, xûrakî rû’h.**
**Xawen: xûdawend, ’sa’hib, xwedî.**
**Mûberra: dûr, berî, berîi.**
**Xelî: xalî, vala.**
**Çah: bîr, çaleaw.**
**Çil: tayê darê, liqî dar.**
**Biwarin: rabiwardin.**
**Tavikengî: heta kengî, heta key.**
**Hezel: bêhûde, beyhûde, bêhûdeyî.**
**’Tifil: zarûk, minal, mindal.**
**Rûsîyah: rûreş, rûyî reş.**
**Xecel: şerm.**

**Şi'irek 'ecaîb**

Katib ji lew'hê (lem yezel), 'herfa ezel te'hwîlîkit
Sirra (elem neşre'h) li ser, mûhra 'sedef tef'sîlîkit

Dil malikê 'husna ezel, nabit kû me'izûlbit ezel
Ter'xîmê çerxê bû mera, dê 'hurmet û tebcîlîkit

Min dî 'xulamanin di dil, tacê mûkellel wan li ser
Xaric ji ber xe'tê qelem, min dî xudan îklîlîkit

Menzilgeha 'hakim eve, belkî bi xû 'hakim eve
'Hukmê li ser baxûy dikit, herçî vîya tenzîlîkit

Ev cadire ya şahe dil, ev bedre yanî mahedil
Çeşmê dilî bê nûr û ser, lazim ji vê tebdîlîkit

Qurane ya Tewrate ew, mî'sba'he ya mîşkate ew
Cibrîle yanî 'Ehmede, nesxê li ser Încîlîkit

Ev 'tûre ya Mûsaye dil, Încîle ya 'Îysaye dil
Menzilgeha esmaye dil, seyran di wan Cibrîlîkit

Ev fîle yanî Rûsteme, ev be'hre yanî qulzeme
Cemşîde yanî cemceme, wek fêrisan û fêlîkit

Ev ’erşe yanî kursîye, ev gaye yanî masîye
Ev cinne yanî însîye, pir weswes û teswîlîkit

Ev ’re’ide ya barane ew, adare ya nîsane ew(**1**)
Ya rew’zeyê rey’hane ew, mîkale Mîkaîlîkit(**2**)

Mîkale ya Cibrîle ew, îcmale ya tef’sîle ew
Ye’hya û Îsma’île ew, îrşadê ’Izraîlîkit

Ya Nû’h û Îbrahîme ew, Idrîse ya te’ilîme ew
Te’xwî’ze ya teslîme ew, teşbîhê Îsma’îlîkit

Ev nûre yanî Nûrîye, ev Nûrîyê Îtûtîye
Şi’iêrek ’ecaîb gûtîye, meq’sûde vê tenzîlîkit

**Çeşm: çav, çaw.**
**Nesx: batil.**

(**1**) Şêx Memdû’hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva ”’ewre” nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye ”re’ide” û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**2**) Şêx Memdû’hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva ”mikyal” nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye ”mîkale” û li hember nivîsandîye (nûsxe).

**’Hakim**

Min dî divî mezarî, bê ’hîkmet û ’hikûmet(**1**)
Bazî û lû’ibekarî, bê mirwetî û rûmet

’Hakim bi xûyî caîr, ’tamî û sifrîya wî
Kuştî mera rûpîye, pir xûn û pir zihûmet

Wî gûte min bixû jê, min gû ji rengê wî tû
’Te’imê te bûme îna, laîq te ew ’ti’ûmet

’Erşek bixû vedabû, gû ez xudayê xelqim
Min gû xuda nemînit, ew celwekar û cûmet

’Sed ’hîle lêmî kirdin, ’heta bi destî keftim
Em ebrem û ’hekîmtir, ez mûberra bi rûmet

’Ebdal û qu’tb û ewtad, yêkser ti hîvîya min
Her wê dikin rîcayê, kû nabrim himûmet

Ez nabirê himûman, min qet ji te nevêtin
Xûş ji guftûgûyîm, ewlatir ez ni’ûmet(**2**)

E’llah çi dil miradî, ya menbe’ê fesadî
Fincan di deste herdem, lê ew tijî ’ximûmet(**3**)

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 115

Şêy'tan û gayê pîre, dinya kirî kebîre
Bû nakisan b'lezetî, ba se'îû ba hicûmet

Pîrê li 'xayetî nûr, Nûrî tu 'arifî zûr
Ey cahilê 'sîba xû, 'teb'et te pîre tewmet(**4**)

Nûrî ji çil û elfê, dikir dused ji hicret
Dûr bû ji 'Ehmedî xa's, lew pir ditin xu'sûmet

Xa'sî zemanî axir, Nûrî tûyî ekabir
Sul'tanê ehlê 'halan, şehwar ba 'hikûmet

Exla'tî û Birîfkî, Îtûtîyîn û Mekkî
'Ha'zir li Qerye Îtût, menzilgehê kilûmet

Ey bendeyê xudayî, rabe seferke îrû
Er'zê muqeddesê 'heq, meqsûdîû hem mirûwet

E'hwal û 'sed meqaman, der cadeyê medîtin
'Arif emîn û 'xewsîn, der cadeyê imûmet

Der cadeyê îmamîn, pir xadim û 'xulamîn
Şahê 'Iîraq û Şamîn, dişmin geha ri'xûmet(5)

---

**Ebrem: pak, xawên, pakij.**
**Himûm: 'xem, 'acizî.**
**Giftûgû: raz û nîyaz, wûtûbêj.**
**Elf: hizar, hezar.**
**Çil û elfê dused ji hîcret: dike 1240 hicrî.**

**Şehwar: wek şah, wekû şah, mîna şah.**
**Ri'xûmet: bi zûrî.**

(**1**) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "divî" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "livî" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**2**) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "xediş ji giftûgûyîm" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "xedşa zi giftûgûyîm" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**3**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "'ximûmet" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "simûmet" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**4**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "te pîre" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "ne bêje" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**5**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "re'xûmet" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "ri'ûnet" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 117

**’Hîkmet**

Te ev ’hîkmet ji bû her nakesî gût
Çi zanim ’xerqetê der be’hrê nasût

Meger Zalnûne ev şahidê l’halî
Ji wîra multeqim der’hale ev ’hût

Şahadet ’aşiqê merdarê bê rû’h
Çawa bêhûşe der ’seddafê tabût

Dinê wê lefkirî resmê ’heyatê
Li nik min nê nemaye ger çi men’ût

Dinê agir bûmin dî ca hilanî
Wekî perwane çi nêvî û bê ’sewt

Ezim ferdê wicûdê bê ne’zîrim
Ji erbabê kemalî nîne yek cût(**1**)

Ji paşî min rehabûn ji xewnê
Hizaran ’enferî wan tên û heyhût

Li ’esmanê ’ebîra min ’ebeq da
Li nik xa’sî li ’erdê miskê meftût

Bixû der ’sewme’a qudsîme Dawûd
Bi ’ilmê xû kez eger cehlê calût

Te meq’sûde bibînî pîrê xerran
Ji ’îrfanê bibîn hadir li ’hanût

Tewa’zû’i jêm geha ’halê fitûwet
Te’tawil ’eybe ey hemrahê ’talût

Li eflakan dibînî tacû î’izaz
Eger zullet gehînî cayê behmût

Di bîrê da gehandî xelqê bê hûş
Hewaû şehweta Harût û Marût

’E’sayanê yedî bey’zaye min vê
Li se’hrê samirî ya se’hrê harût

Te pirtew dane ’ammî ger {çi bûdî}
Mehê tabanê meşriq cayê Îtût

Beyana vê mu’emmayê guher senc
Çira Nûrî tebû her nakesî gût

---

**Bê ne’zîr: bê wêne, bê hawta, bê nimûne.**
**Rehabûn: azadbûn, rizgarbûn, xilasbûn.**
**’Ebîr: gûlav, ’etir, ava gûla.**
**Misk: bêhnek xweşe ji navka ’xezalan (asikan) dertî-**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 119

**nin, wek derman jî tê bikaranîn.**

**Kez: ke ez, (dîyare di serdema Şêx Nûreddînî da ev peyv bi vî awayî dihate bikaranîn).**

**Tawa'zû'i: firûtenî, xû kêm zanîn, xû be gewre nezanîn.**

**Hemrah: heval, dûst, hawrê.**

**Harût û Marût: dû melaîketin, dû milyaketin, dû melaîkin, dû firişte ne.**

**Pirtew: tîşk, çira, nûr, rûnahî.**

**Ger çi bûdî: Kû tu bûyî, ke tu bûyî, ke bûyt.**

**Mehê taban: mangek ke edrewşêtewe.**

**Mû'emma: nihênî, veşartî, metel, sirrî.**

**Guher: gewher.**

**Guhersenc: kesek kû nirx û bihayê zêr û zîvî der tîne û rastîya wê xûya dike.**

**Nakes: kesê xirab, kesî xirab.**

(**1**) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "kemalî" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "kemalim" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

**Newêrim**

Dîsa qe newêrim kû bikim keşfû keramat
Ger çendî me pir dîtine e'hwal û meqamat

Dil şibhetî qêrîn, di reşin ba'tinî pir teng(**1**)
Însanê divî 'esrî xû 'tiflê be 'emamat

'Ucbê weve geştîne ji kubra wekû şîrîn
Ba'tin di cebanin û bi'zahir hene lamat

Malxûlîye wan deyne di xewda kû dibêjin
Cuziek me ji we'hyê heye, der weqtê menamat

Deqdane li lêvan û li gev, neqşê hişî kir
Kû qencî bibînin me çi xe'tin, me çi şamat

Etba'ê nifûsin jinê malan diperêsin
Teşbîhê şîyûxin li serî tacin û hamat

Mel'ûnî kirin nefs û hewaê, çi nizanin
E's'habê kûlahin bi rêda fês û kemamat

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 121

We'i'zê dime naçin ve dilîda ji wicûdê
Fir'ûnî mîsalin ji dema'xî be şahamat

Lew min ji ewan mu'itekefî girt û revîmî(**2**)
Êdî ne vîyam şîret û exbar û kelamat

Destan di qutin kûtir û 'teyran direvînin
Hîvî çi dimînit me ji erbabê 'hemamat(**3**)

Mehcûrî kirin mu'itekef û mescid û quran
Naêne xîyalê çi xudan fe'zl û keramat

Nûrî tûyî ser merkezê 'îrfan û meqamat
('Semten we ximûlen we zebûlen we selamat)

---

**Qe newêrim: qey newêrim, qet nawêrim.**
**'Ucbê weve: sersurmanî êweme, ecêbmayê weme.**
**Geştîne: gehiştîne, geyîştîne.**
**Malxûlîye: nexûşîya zûrpeyvînê, nexûşînî zûr qisekirdin.**
**Menam: nivistin, nûstin, razan, xewtin.**
**Deqdan: geztin, kirûştin, leqdan, gezkirin.**
**Hîvî: ûmêd, hîwa.**

(**1**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "pir 'teng" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "pir jeng" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**2**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "mu'itekefî" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "mu'itezelek" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**3**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva "dimînit" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "dimînin" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 122

**Teemmel hazîhîl ekwan**

(Teemmel hazîhîl ekwanû îz hûnnel ’tewa’xîtû)
(Îza e’imet ’enîl mewla we îlla felyewaqîtû)

Newaciz b’gre pê tilîyan û me’hbûbê ji dil bigre
(’Hecîcûl ’amî qed fatû we fatetkel maweqîtû)

Mûnacatê bi Quranê ke (la tel’eb bîîncîlî)
(De’îl ekwane bîlquranî elhetkel tewarîtû)

Meta’ê sûk û bazarê ji vî ’e’srî dûkanek ma
Cewahirtî hene bê ’heddî wan (cellet ’hewanîtû)

Esa’tîrê di dîwanê li nik pîrê li meyxanê
Eger ’hel kit bi tefsîrê (etet mînha tewabîtû)

Ji kusretê we’hdeta mû’tleq, me’zahir er mû’eyyen kit
Çi hîmmeta yêk d’bê wa’hid (we ma qultû newasîtû)

(Fefî za wechîhî badîn we fî haza tecellîyehû)
(Fela Zeydûn wella ’Emrû ecel kullûn lewahîtû)

(Fela yûxfa ’enîl ’eyneynî fî e’hdaqîna Nûrî)
(’Hebîbûn mûctelîn lakîn tûwarîhûl ’tewa’xîtû)

---

**We’hdeta mû’tleq: Xwedêyê mezin yê yêk û bi tenê, Xûwaî tak û tenya.**
**Mû’eyyen: dîyarkirin, dîyarîkirdin, te’iyînkirin, nîşankirin.**

**Sali'hê naqet**

Hehe naqet devê beş, bê şikil sîh, reng û lîyaqet
Kû çû egerin û dexsî li dilî kirme ne'taqet

Here ey bed'sîfetê, zikreşê, mislê kerê reş
Mew û te qet nîne vêkra, ne 'sedaqet, ne 'elaqet

Wê çi lêkim, gelî xelka, qe ne şerme, qe ne 'eyb
Bi kûtek za ezû tû, her hem yekîn bi 'sedaqet

Here wî 'erdê tu jê hatî, ji pêşim, here zû
Bi qişî, bê ne'zerî, şiklê bera'zî ji belaqet

Qederim kû qederim kû qederim kû qederim
Qederê bedqederê, min nîye qudret nîye 'taqet

Heye xaret, heye taret, heye 'taqet wekû dêw
Ne tubî, û ne xudanê te here, naqetê naqet

Dîz û kasik me tijî zad kirin, ab kirin
Bi simû kabê mezin, rêtin yêk cûmle îraqet

Li dûkaname nehêla te meta'û, ser û mal
Ji te 'xafil me kûdî hatî birin dizker û baqet

Bi du lêvê di şibî çêlê belek, herwe di qûrî
Here ey pîsê necis, kûne me vêraye şerafet

Ne tûbî û ne xudanê te bitin, bê edebî
Ji gunaha te qedîm bûle tijî, kûne fewaqet

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:57 PM Page 124

Te nevêtin, te bivêtin, teû 'sa'hbê we dikim
Di dinêda ji 'iyûban kû 'eyan bit we 'hemaqet

Her çi cayê me bixû girt û sikûnek me liwê bû
Hadirî hatî biwî agir û pêtî û 'heraqet

Sed qeda lêt bikevit, ev çi xudanbextê bedî tû
Tû mirbayî çi bêbextê kû wî nîne şefaqet

Nirnira 'sa û beraza, ji te daim tigehît
Here vê nirnirê beske, ey sehê guh bi şelaqet

Tû û 'se'hbê bixû yêk yêk we tinasî bi zewac
Here ey zewcetê gaê, reşê wergêraî retaqet

Te nehêla li dinê qu'tbê Birîfkî bixûşî bit
Were cezzarî vekuj, ger çi bibit 'Sali'hê naqet

Were Nûrî tu sebeqde, here bin tûxekê dî
Ma tinê tûxeke dinya, tu xudan fûrqe bisaqet

---

**Bed: xirab.**
**Bed'sîfet: rewişt xirab, bedrewişt.**
**Xaret: rûreş, rezîl, sûk.**
**Dêw: dêw û dirinc.**
**Naqet: 'heywan, dabbe.**
**Dîz: dîze, qazana ji teqnê (herîyê) dûrist dikin, qazanî li xul dirûst ekrê.**
**Tûx: şiwên, cih.**

## Herf el-Sai (pîta ”S”)

### El-’xîyas

Her ji ber hicra te canim, el-’xîyas
Bê dil û rû’h û rewanim, el-’xîyas

Wek mehê nû hem ’ze’îf û berzeyîn
’Xerqeyê be’hra ’xemanim, el-’xîyas

Xaneqahê ’sûfîyan wêran nekin
Da bibûrî lê tu xanim, el-’xîyas

Bilbilê dil şibhetê, ’tenbûr û ney
Sîne pir ah û fi’xanim, el-’xîyas

Qewsê reştûzê tenêkî jê verist
Lew ji dil ’sed derd û janim, el-’xîyas

Bê wicûdîn em ji ber cewra giran
Lew li ser derdê giranim, el-’xîyas

Em ’era’z dilber bi xû zatî gule
Ba’xê yar ez ba’xebanim, el-’xîyas

Her tinê yek le’h’ze min dîba ji dil
Eşk tibû eşkê rewanim, el-’xîyas

Şarazayê we’hdeta mû’tleq emîn
Sa’hil û qe’ir û ’umanim, el-’xîyas

Serfirazî qu’tb û ebdalîn û ’xews
Belkî ez qu’tbê ewanim, el-’xîyas

El-'xîyas ez lew tinalim vê demê
Kes nizanî ya dizanim, el-'xîyas

Dil wekî barûte ya mislê pirreng
Mûbtelayê dilberanim, el-'xîyas

Dilberê min 'sed wekî 'sen'anîyan
Dilribalû yêk ji wanim, el-'xîyas

Çerx û azarê te dinya têkî girt
Pir 'xîyas û pir emanim, el-'xîyas

Tûleyê dergahê dilber Nûrîye
Yasegê der asitanim, el-'xîyas

---

**Rewan: jîyan.**
**Mehê nû: mangî taze, hîva nû.**
**Sîne: sing, mebest li vir (dil) e.**
**Fi'xan: derd û 'xem.**
**Qewsê reş: mebest li vir (birî, birû, ebrû) ye.**
**Ba'xeban: baxewan.**
**Eşk: firmêsk, rûndik, esrîn, hêsir.**
**Eşkê rewan: rûndik barîn.**
**Sa'hil: kenar, kinar.**
**Qe'ir: qûlayî, kûrayî.**
**'Iman: be'hra 'Iman, be'hrî 'Iman.**
**Mûbtela: tûşbûn, cîrûdeh.**
**Dilribal: dilrifandin, dilbirdin, gîrûdebûn.**
**Tûle: seyê biçûk, segî biçkûle.**
**Der: dergeh, derga, derî.**
**Astan: barega.**
**Der astan: ber barega.**

**Derya 'ebes**

Durdanîya bes bîne der, ez dil wekî derya 'ebes
'Ewrê sîyeh 'ammî li ber çava hemî dinya 'ebes(**1**)

Kewîn û bilbil ser bi ser, ev 'endelîbê xûnceger
Bû na temamî pinçebir, gûyaye pir gû ya 'ebes(**2**)

'Ilmê kelîm û rû'hê quds, tu ji 'arifê dane bipirs
Ev şehrezayê cadeyê mehcûre wek se'iya 'ebes(**3**)

Ta key hilînim tacekê, ya xû bikim mî'iracekê
Bînane bêtin çeşmê dil, ev texteke 'ulîya 'ebes

Ev textike lê xusrewîn, Kîsra û Qey'ser lê ewîn
Leyla û Qey'sî zanîye, bê qeyde maluqiya 'ebes

Wek cewhera be'hrîme ber 'hûtê li pêş mehcûrî kir
Dêwî di dest perda sîyeh lew çû û xûş tû, ya 'ebes

Bê 'eqlû 'îrfan û 'zerer, roj lê geha bûrca esed
Lew 'sût li wî cerg û kebed, ma bê hişû d'xerba 'ebes

Saqî di destda qerqefe, meyxane pir çeng û defe
Belqîs mûnasib asife, mey da belê rijya 'ebes

Rijya û cûziek tê nema, 'am man li ser derdê 'xeman
Lê min bi xû 'sed cilwe ma, bê badeû na'hubba 'ebes

Nûrî bi nûra badeyê, dil ma di kul şehzadeê
'Hacet bivê sicadeyê, çi dibê dilê derya 'ebes

---

**Dûrdanî: didandûrr, dîyanî wek altûn (zêr) dirandûrr.**
**'Endelîb: teyreke.**
**Bîna: bînîn, rûşin.**
**Bûrca Esed: yêk ji hîvên salêye beramber bi hîva (Gelawêj, temmûz) e.**
**Asif: mat, 'xemgîn, ziwîr.**

(1) Şêx Memdû'hî li jêr peyva "çava" nivîsandîye (Bî'hezfil elîfnûsxe), kû tê mena di destxetekê da bê elîfe, kû dibe "çav".

(2) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jûr peyva "pence bir" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "bê xeber" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(3) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jûr peyva "se'iya" nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye "şe'iya" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

**Pîrê ’hedes**

Pîrejin dinya û dil, lazim ji wê pîrê ’hedes
Zêrê jîna se’hrîya û samerî, pîrê ’hedes

Ger li wê pîrê bi nêrit, wê demê kafir dibit
Leşmirare, ser ’isabe, rengê dilgîrê ’hedes

Da nebînit wê zinê, ya dil wi’zûyek dê bişût
Lamisû melmûs bi xû dest daye xinzîrê ’hedes

Dil di benda wê ciwanê danîya iblîsî ma
Herkesê ’husnê ’ecûzê qe’sde êxsîrê ’hedes

Ger bişûtin dest û çavan, paş kû dê şiklê mirad
Nîne ’hacet wî bi ’zerba, tîr û şemşîrê ’hedes

’Arifê qe’sda ’tewafê kit bi re’hmê fer’ze lê
Dê mûcerret bit ji libsî û zîwerî, mîrê ’hedes

Ewelî pavêt ji xû melbûs û melmûsê dinê
Dê biî’hramê hilînit ’helqe zincîrê ’hedes

Hem mûbeddel kit ji ’ucbû kibrîyaê zulletê
În’tîba’i û în’îkasê mîr û wer zêrê ’hedes

Yûsifê Misrî ji bîra ’zulmetê xaric dibit
Xûş dibînit ’izeta, daraû keşmîrê ’hedes

Mûn’tebi’i dil maye wek heyvê, ne ’ewr û ne ’hîcab
Pirs bikin ’ilmê ’xerîb û be’hsê te’ibîrê ’hedes

Be'hs û te'ibîrê ji Yûsif ya ji Kerrarê 'Elî
Her tibê dinya kû dasê 'telqe te'hrîrê 'hedes

'Xafilane û cahilane we'ide bû wî we'ide kir
Paş kû hû rengî te kir, lazim bû tekfîrê 'hedes

'Hir's û telwî'a bi dinyaê, 'tebî'et kelbe ew
Zuhdê şafî fer'ze herçî qe'sde qe'tmîrê 'hedes

Dê bi zuhd pir pakî bit, dinya şibî kelbê mirar
Îmtîzaca ab û xakî zûhd û te'ifîrê 'hedes

Ma necaset pak dibit îlla bi vê ava 'tehûr
Cîfe û pir hîzîya dil, av û te'thîrê 'hedes

{Zînhar î dil ez în 'xew'xayê 'xeflet Nûrîya}
{Rehgûzer bazarê 'xeflet hest teşmîrê 'hedes}

---

**Danîya: danan.**

**'Ecûz: pîrejin, mebest li vir dûnyaye.**

**Şemşîr: şîr, şûr.**

**Yûsifê Mi'srî: îşarete bû pê'xember Yûsifî kû di nav bîra tarî da bû.**

**Dara: bedesthelat, bedeselat, tûwana.**

**'Elî Kerrar: îşarete bû ('Elî bin Ebî 'Talib) Xwedê jê razî.**

**Zînhar: înzar, agehkirdnewe, agehdarkirin.**

**'Xew'xa: aşûb, paşegerdanî.**

**Rehgûzer: kesek kû bi rêyekê da diçe, kesêk ke be rêgayêk da tê eperêt.**

**Hest: heye.**

**Enwere ’xews**

Berzexê ’aleme ya Nûrîyê dil enwere ’xews
Afitabê li felek belkî mehê şehwere ’xews

Ba’xebanê e’hedîyyet ne tinê ’arifê xas
Celweyê şeb be yeqîn pîre û pê’xembere ’xews

Ne bi te’hqîqê ’emel hatîye meydanê kemal
Me’zherê fi’ilê ’heqû, lu’tfê şehê ekbere ’xews

Wekû aîne me dil girtîye der be’hrê kerem
Neynika rûyê xudawande û nîlûfere ’xews

Biçû ’terzane tibû ’ha’silî tiştek ji xi’sû’s
Hadirî cezbe gihaê kû ji nû serwere ’xews

Wer binêrî ba’xê ’arif gulçimen pir tê hene
Xû bi rûiyê leb ji qend û şahid û esmere ’xews

Ya bibîn saqî li ser destî hene sed kase çîn
Sel’tenet cah û emîr û şah û Îskendere ’xews

Da nebînî perdeya ’arif li ser ’zahir di best
Ba’tinê be’hrê nema pir gewher û cewhere ’xews

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ  20/7/02  3:57 PM  Page 132

Er te cuziek ji wî'salê bi dîya şahidê 'hal
Ne dima hûşî te ev çendî 'Elî 'Heydere 'xews

Bi la'tefet ji kesê laîq û dil 'safê emîn
Lê bîna 'eqlî li cergî pire ev xencere 'xews

Tû ne ev 'tiflê ji bistanê peyapey şîrexûr
Me li dinyayê peyapey çi 'eceb zîwere 'xews

Bi lîyaqet me kerem pêşî li her kes di kirin
Heye mûmkin bi lîyaqet ji xirran gewhere 'xews

'Helqeya mer'hemetê ger te divê qencî hebî
Bibe tarik ji wicûdê kû mû'hib bê sere 'xews

Ji fenayê me bi xû can û cesed nîne ebed
Bi xû rengê me şibî bilbil û rezê zere 'xews

Ji senayê te xûdawende me dagirtîye weqt
Nîye weqtek me ji 'xeyrî te senayê fere 'xews

Ne tu mû'htacî meyî, belkî emîn mu'htacî te
Rûzeyê lu'tfê te bê 'xayetû bê deftere 'xews

Ji mera Nû'h û Nebî Şîte îmamê hemîyan
Gazîya dest û du'a her se'etê ber dere 'xews

Ne bi şetrinc û bi lu'ibê me biwarîne çû van
Rûzekarê xû wekî rû di şehê Qey'sere 'xews

Geh ji şerqî, geh ji 'xerbî, geh li 'er'z û li felek
Şahîyane me tigû tacê miradî were 'xews

Dê ji cinnû ji beşer mûn'ekisû 'adetîyan
Ji firişte bigehin fer'he û 'sed 'enfere 'xews

Mededa 'zahir û ba'tin here Nûrî bigirîn
Çi tibê paşî te dil nîmê mehê, enwere 'xews

---

**Aftab: tav, hetav, hetaw, roj, xûr.**
**Şehwer: bi nav û deng, be naw bang, meşhûr.**
**Ba'xeban: baxewan.**
**Cilwe: bînîn.**
**Şeb: şev, şew.**
**Aîne: awêne, mirêk, şûşe.**
**Neynik: awêne, şûşe, 'eyne, qûdîka rûnahîyê.**
**Nîlûfer: asiman, gûleke baharêye.**
**Kaseçîn: pîyala Çînî, pîyaley fe'xfûrî, pîyala Sînî.**
**Peyapey: be dûwey.**
**Firişte: melayik, melayîket, melayîke.**

**Weqtê ’hedîs**

Cergê têkel xûnê der weqtê ’hedîs
Şeb kûllî kelkûn ey bextê ’hedîs

Bazê dil hicran tikit heykel qefes
Paşî kû tê şemmeyê ’semtê ’hedîs

Çeng û na’ûra me jê tên ’sed ’seda
Ta gihayîn lewleba ’heftê ’hedîs

Daneya weqtê ’se’hergeh min veda
Nagehan ’hûrî geha guftê ’hedîs

Qemrîya awaz û bilbil dengê deng
Her peyapey tê û revrev tê ’hedîs

Sed perî min dî di ber weqtê sûbê
Têkelî sipêdê bi ’sef’sef tê ’hedîs

Agirek hil bû di dil da min ji ’işq
Agir û pel bû li ser neftê ’hedîs

Ma ’hedîsek bê tu ez gûh pê nedim
Lê me der dil sed hizar sextê ’hedîs

Niştera zulfa sîyeh wextê geha
Cer’hîya canê me bûn hestê ’hedîs

Mûsteme’i hatin nebê ezman û zar
Ne’xmeya mizmar û ney lew tê ’hedîs

Mûrdeyî kûrîn wekî ’e’zmê remîn •
Rengê zer bîtin cesed seqqê ’hedîs •

Ger melek bêtin ji min pirsê bikit
’Huccet û bûrhanê min ’heştê ’hedîs

Er ’hedîsa lebguher qenda mebî
Der cewabê her peyapey tê ’hedîs

Bê bi ezmanê minî ixbarîda
Lew çu defter ’ilm nagehtê ’hedîs

Dil bi xû wek deftera ’husna teye
Bê ’eded enwar û pertew tê ’hedîs

’Er’zû ’halê dilbera dildarî bit
Sîne jê ef’xanî bê ’hed tê ’hedîs

Ra’heta herdu sera îqbal û bext
Nûrîya wi’llahî der weqtê ’hedîs

---

**Kullî: giştî, hemî, hemûyî, tevî, gişk.**
**’Seda: deng.**
**Qûmrî: teyreke wek bûlbûl, balindeyeke wek bûlbûl.**
**Nişter: cûrekê xencerêye, çeqoyêkî zûr tîj û barîk.**
**Pertew: tîşk, rûnahî, nûr.**
**Ef’xan: fû’xan, nale.**
**Îqbal: şans, bext.**
**Sera: mal, mebest li vir (herdû sera: herdu dûnya) ye.**

• Ev herdu rêzên sitêr li ber, di destxeta Şêx Memdû’hê Birîfkanî da tunebûn, me ji destxetek din dîtîye û nivîsîye.